

N ameya Newroz e

Hersal bi hatina roja 21-ê heyva Avdarê re , gelê Kurd serûber , cejna xwe ya netewî, Newrozê bi bîr tîne, biçûk û mezin, jin û mêr, zarok û navsal bi dil û can dixwazin pê şa bibin. Vêca li gor merc û hoyên jihev cuda, taybetmendiya her welatek û herêmekê, şêwe û durîsmên cur be cur û pir reng tîne hildan û bikaranîn , Lê, naverok yek e , hestên dilgermiyê û hişyarbûna netewî ye, dengvedana doza Azadî, Aştî û Wekheviyê ye, doza mirovhezî, şahî û xweşiyê ye.

Li vê dawiyê, li ser daxwaza hinde endamên komela neteweyên yekbûyî, rêxistina Yoniskoyê-UNSCO- erê kiribû û biryara xwe dabû ku, Newroz weke cejneke cîhanî bête Pejirandin û nasîn, lê mixewbin, bê ku gelê Kurd bi nav bibe .

Li Sûriyê , li dirêjahiya bêtirî 50 salî, xebatkarên Kurd ên demokrat, bi ronîya çavan , bi cerg û hinavan, Newroza gelê xwe parastine û her dê biparêzin, ji ber ku ev Neroza me , ne tenê cejneke salane ye û hew,lê belê, şana rûmetê, hebûn, vejîn û jîndariya gelê Kurd e, lewre jî, cejna Kurdan ya herî biha û Pîroz e.

Di dema îro de, ji bilî pêxistina agiran li serê çiyar, li seranserî herêmên Kurd li Sûriyê,Kurdax, Kobanî û Cezîrê, digel bajarên navdar mîna Heleb, Şam, Heskê, Reqê û Latakîyê jî , Newroz şên dibe, û bi deh hezaran hemwelatî,çi Kurd, Erebi,Siryani, Kildo-Asori, Çerkez, Ermeni û Turkmeni , File û Misilman tîne ba hev û bi lihevkiyaneke biratî Nerozê pîroz dikin ,rê li ber xwedî hişên teng, hişk û nijadperest, çavsoyîya şovenîstan teng dibe,nemaze gava ala niştîmanî tete bilindkirin. Loma jî, rêzgirtin û parastina ev reng kombûn

govendên Newrozê, erk û ustibarê hemî hêz û kesa ye,Newroz jî hemiyar hembêz dike.

Li dawî, hêjayî gotinê ye ku,ji Newroza par ta Newroza îsal 2011,sê xebatkarên newrozperest,ên di nav gel û tevgera Kurd de navdar , me wenda kirin, ew jî, serokê parta me mamoste **Îsmail Umer**, yek ji danerên yekemîn partiya siyasî bona Kurdên Sûriyê, mamoste **Reşîd Hemo** û Mam **Ebdil-Xenî Biloriyan** ê ku di ber gelê xwe yê Kurd de bêtirî 25 salan di girtîgeh û zîndanên Îranê de borandibû, emê bejna xwe li ber xebat û bîranîna wan û hemî camêr, xebatkar û pakrewanên tevgera azadîxwaz a Kurd bitewînin û şehîdê Newroza Şamê li sala 1986 -an **Mehmed Emîn Silêman Adê** bi bîra xwe bînin.

Bijî xebata gelê Kurd bona Aştî, Azadî û Wekheviyê.

Bijî Newroz û sersala we hemiyar pîroz .

18 .03 .2011

Komîta rêvebir ya Parta Yekîti ya Demokrat A Kurd li Sûriyê.

